Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEWROZ

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê ~ YEKÎTÎ*
Email : Newroz95@hotmail.com

Hejmar(65) Berçile 2005 z~2617 k Buha (15) p.s

Binpêkirina mafên mirovan li Sûriyê

Li gor biryara rêxistina Komela Giştî ya Yekîtiya Netewan, ku hersal roja 10- ê Berçile, bi roja bîranîna mafên mirovan li seranserî cîhahê be. Vêca li Sûriyê jî hinde partî, navend, kes û komele, nemaze rêxistinên mafên mirovan hewldidin ku, dengê xwe bighênin xelkê xwe û derdoran.

Taybetmendiya rewşa Sûriyê di siha rijîma tek-partî de, digel tunebûna qanûneke kêrhatî bona hebûn û lebata partiyan, dike ku, mafên mirovan li Sûriyê her û her bêne binpêkirin û dadgehên henin jî, ne ciyê rêzgirtin û baweriyê bin. Lewre jî, biryarên wan dadgehên awarte, li ba partiyên siyasî yên ku, ji rijîma Be,s re ne berdevik, nayêne pejrandin û her ciyê şermezarî û protestokirinê ne. Ji ber ku, ew biryarina serûber bûne navnîşanên balkêş ji binpêkirina mafên mirovan re. Loma jî parta Yeketî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê, li gel hêz û pattiyên dî, di çarçewa damezana Şamê (Îlan Dîmeşq) de, li beramber binpêkirina mafên mirovan xwedî helwest e û her dê li pirsa Kurd û demoqrasiyê li gor bernama xwe ya siyasî xwedî derkeve.

Divê baş bête zanîn û bawerî li cî be ku, çand û mafên mirovan bêne rêzgirtin, parastin û bi cîkirin, rê li ber çand û dezgehên demoqratîk vebe. Ewqas çaresekirina pirsa Kurd nêzîk dibe û derî li ber nijaperest, sergerim û qafhişkan têne girtin .

Sînorê Yekta

Dijberiya Kurdan

Xala hevbeş ya Turkiyê û Îranê dijberiya Kurdan e

Dewletên Îran, Turkiyê û Sûriyê herdem li ser xalekê li hev dikin û dijî disekinin , ew jî **pirsgirêka Kurd** e . Vê carê jî Mencehr Mutekî , wezîrê deve yê Îranê di sefereke 2 rojî de gihîşte Enqere û bi rayeder û berpirsiyarên bilind yên Turkiyê re hevdîtin û gotbêj kir. .. Lê , li gorî rapora ragihandinên Turkiyê , her du wezîrên derve yên iran û Turkiyê li ser hin xalan li hev kirin . **Pirsgirêka PKK ê, pêşîgirtin ji parvebûna Îraqê û berlêgirtin ji belavbûna ne ewlekarî ji bo herêmê**, xuya û aşkira ye ku, merema wan her2 welatan ji barvebûna Îraqê û belavbûna ne ewlekariyê , li deverê … ku wan herdem dijî Kurd li hev kiriye....ji R. **Agirî**